Ez yan Mihyo ?

Ezimk

Wê rojê ez li çayxaneyê rûniştîbûm, di ber min re borî, çakêtek li serserî bû, yek jî li ser zenda wî bû ji bilî ku yek jî li ber bû, pêlava wî kitek neal bû û ya din jî kitepêlavek e diryayî bû , rih gevoz e, serê wî qijavij û cilkên wî bi givêşin devê marî wê req bibe, dibêjin di wextê xwe de lawekê medenî bû, cihêlekî lêkdayî û pir sipehî bû, peyvên wî şêrîn û dilvekerbûn, sihbetên wî dilneêşbûn, rewşa hevalan bû. Lê qedera wî wisa çêbû dema ku rejêmê bi xurtî biriye serbaziyê, ha li wir ampolek bo danan û rojgara wî gihande roja îro ku berdewam li ser cadeyan piyaseyê bike, qunka cikareyekê bi serê ya din ve pel dike, lê tiştê baslkêş li cem vî mirovî ewe çu caran pereya na xwaze tenê heger dilê wî diçe çayekê ew jî bi bin kaskê vedixwe, çu caran dilê kesî nahêle, kêm diaxive. Ji ber van hemû taybetmendiyan xelkê bajêr pir jê hes dikin û nahêlin bimîne bê xwarin û cilik û cikare, nivistina wî jî li mala xwedê ye, her roj malek xwarina wî dabîn dike û bo dibine mizgeftê.

Dibêjin çend cûnên dînan hene û her kes di hebûna xwe de dîne, tenê nizane jimareya dînatiya wî çende, vêca ez jî nizanim ka ez yê dînim yan Mihyo, tenê cawaziya di navebera min û Mihyoyî de ew e, ew dizane hijmara wî çende, lê ez ya xwe nizanim, evên mîna min xelk li ser cadeya silav dikinê ji ber ku jimareya dînatiya wan peçinî û nepeniye, lê yên mîna Mihyoyî ku jimareya dînatiya wan bi pêlav û cilkan tê hember kirin xelk pûteyî pê nakin û bi çavê sivik lê dinerin.

Salih Xazî

Morîs Mîtirlîng nivîserekî bi biniyad Belcîkî bû û bihitir ji 50 pirtûkan nivîsiye, du salên dawiya jiyê xwe li nexweşxaneya dîna borandin, niha jî di mêjûyê de yek e ji nivîserên bilîmet û navdar, ez ne mirovekî saykolojînasim lê ez wisa hizir dikim ku Mihyo gelek ji min û yên mîna min bi aqiltir e û hind xwe bi dû jiyanê ve nawestîne, çu caran behsê ratib û parçeya ardî û tirûmbêl û… htd nake.